Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Sibat / 15 - 2 - 2022 Kurdistan-Hejmar (215) www.pdk-s.com

# Topbarana deverên sînorî tirs xistiye nava xelkê

Kurdistan **Ehmed Omer-Qamişlo**



**Di vê dema dawî de, li gundewarê Dêrik, Amûdê û Dirbêsiyê artêşa Tirkiyê çend baregehên HSD û grûpên ser bi PYD ve topbaran kirin, di encam de ziyanên canî û madî hebûn, vê yekê hiştiye tirs bikeve nava xelkê de. Welatiyek ku nexwestiye navê xwe eşkere bike dibêje" çekdarên ser bi PYD ve hin top li aliyê Eyn Dîwerê avêtibûn artêşa Tirkiyê û wan jî bersiv dabû, lê ew vê rastiyê ji xelkê re eşkere nakin, ev rêxistin bûye bela li ser serê Kurdên Kurdistana Sûriyê, û divê sînorek jêre were danîn". Welatiyekî din dibêje" gelo baregehên serbazî di nava xelkê sivîl de çi dikin, divê ew dûrî xelkê bin, êrîşên Tirkiyê di dema dawî de zêde bûne û ev yek jî tirsê li cem me wek welatî çê dike. Herwiha bila kadirên PKK ji Kurdistana Sûriyê derbikevin ji ber ku ew dibin hinceta Tirkiyê".**

# "Derxistina astengiyên li pêş karên partiyên siyasî û rojnamevaniyê kiryareke dijî mirovahiyê ye"

Kurdistan

Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S raporta xwe ya siyasî belav kir û rojanmeya Kurdistan beşek jê wergirtiye ku têde ragihandiye, Giringtirîn bûyer di vê dema niha de, liv û tevgera DAIŞê ye û bi awayekî ku cihê matmayînê ye, ku di roja 202022-1- êrîşî zindana Sînaa li taxa Xiwêran ya Hesekê kir ku li gor ragihandinê 5 hezar DAIŞî di nava zindanê de bûn, û ev yek diyar dike ku hemahengiyeke di navbera grûpek ji wan girtiyan hebûm û ev yek jî hin pirs dirust kirin û ji wan: Gelo çawa ev êrîş pêk hat? Û çawa çek gihiştin nava zindanê? Û çawa hejmareke mezin ya girtiyan reviyan? Û çawa ev tevgera nava zindanê hevdem bû ligel liv û tevgera DAIŞ li Sûriyê û Îraqê ûhin deverên din, lê ji zanyariyan û helwestên aliyên peywendîdar û sûdmend ji vê bûyerê, derdikeve tişta ku rûdaye di çarçoveya planeke mukim de bû ku gelek alîiyên navxwe û herêmî û navdewletî têde beşdar bûn, ew jî di rêya xerqên ewlekarî, û tiliyên tometên ji bo welatên Astana-Soçî, Rûsiya, Tirkiyê û Îranê, herwiha rejîma Sûriyê tê arastekirin, ji bo fişarê bixne ser PYD ku berê xwe bide rejîma Esed, û divê welatên Hevpeymnaiya Navdewletî û bi taybet Amerîka, herwiha fişarxistin li ser rewşa siyasî ji aliyê Îran li Îraqê, piştî kêmbûna rola grûpên ser bi wê ve bi taybet piştî hilbijartinên vê dawiyê, lê encamp berûvajî bûne û di aliyên xwe yên sereke de pêk nehatin, lê Amerîka hebûna xwe li deverê bihêz dike û karî Serkirdeyê DAIŞ El-Qureyşî li Idlibê bikuje, û şerê dijî DAIŞ nû dibe û arasteyên nû ji xwe re dibîne. Tişta girêdayî krîza Sûriyê, û hewlên ji bo çareseriya siyasî bi rêya Şanderê Navdewletî bo Sûriyê Geir Pedersen, hewlên wî ji lidarxistina civînên Komîteya Destûr car caran ji aliyê rejîmê û carna ji aliyê opozîsyonê vet ê redkirin, ji berk u rejîm naxwaze berev çareseriya siyasî ya aştiyane ve biçe, û ev yek rewşê xerabtir dike û taybet ji aliyê rewşa jiyana welatiyan û rewşa abûrî, û xwepêşandanên vê daiyê yên parêzgeha Siwêda nîşaneke diyar e, û opozîsyonê jî tişta ku Şanderê navdewletî pêşkêş kir redkir li gor pransîpa davek beramber gavekê, anku gavek ji danûstandinan beramber gavek ji vekirina navdewletî lis er rejîmê,



anku çareseriya siyasî li gor biryarên navdewletî û bi taybet biryara 2254 û lêvegera Cinêv1 niha asteng bûye, û taybet nakokiyên di navbera aliyên navdewletî yên peywendîar"Amerîka û Rûsiya " zêde dibin û arasteyên steratejîk werdigre û bi taybet piştî pirsgirêka Ukrayna û teqîna rewşê li Kazaxistan, û hevpeymaniya di navbera Rûsiya û Çîn di rûbirûbûna Amerîka û Rojava de, ev yek jî hiştiye ku piştevaniya zêde ji bo rejîma Sûriyê zêde bibe, û vê yekê hişt ku rejîm li ser helwestênx we rijd û berdewam be.

Ji aliyekî din ve, hin hewl hene di rêya dîdarên siyasî li Qeterê, tevahiya aliyên opozsyona Sûriyê ê beşar in, ku diyare cidî ne ji bo rewşa opozîsyonê û şêwazê serderiya wê ligel tevahiya dosyên siyasî, û dibe ku ewên ev kar kirine careke din opozîsyonê rêk bixin, û rola wê jî aktîv bikin. Tirkiyê dûrûtiya siyasî bikar tîne, carnan ligel Rûsiya ye di pirsa Sûriyê de, û carnan nakoke ligel, herwiha lidijî siyaseta Amerîka ya li Sûriyê ye û carnan li dijî siyaseta wê ya li Îraqê jî, herwiha ligel Îranê hemahengiyê li Soçî û Astana dike, û di pirsa Azerbeycanê de nakoke. Kurdistana Sûriyê, heta niha rewşa jiyana rojane ya xelkê xerab e ji ber bêkarî û kêmbûna heqdestê karkeran û buhabûna bêhempa ya kelûpelên sereke û nebûna hin madeyan li nava bazaran, herwiha zêdebûna krîza sotemeniyê û bi taybet mazotê û firotina wê li bazara reş, û wek em dizazin zehmetî li Efrên û Serêkaniyê û Girêspî zêdetir, û binpêkirin berdewam in û haletên revandinê hêj jî hene, hevdem zehmetiya deverên li ser sînorê Tikriyê zêdetir dibe ligel topbarana bêserûber ya Tirkiyê û hêzên ser bi wê ve. Tevî vê rewşa xeraba giştî, lê Hêzên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD bêhtir hêzên siaysî asteng dike û bi taybet partiyên Encûmena Niştîmaniya Kurdî, herwiha stengiyên ku li pêş rojnamevanan û torên ragiahndinê Kurdistan24 û vê dawiyê li ser Rudawê û revandina hejmareke rojnamevana û ji wan Bawer Mele Ehmed ku serbest hate berdan û nûçegihanê ARK Sebrî Fexrî bi rsatî ev kiryar li dijî mirovahiyê ne.



# HSD danpêdanê bi şikestina xwe li zindana Xiwêran dike

Kurdistan

Fermandarê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) Mezlûm Ebdî ji ajansa nûçeyan a Associated Press re li xwe mikur hatiye ku berpirsyarita êrîşa meha borî ya li ser Girtîgeha Xiwêran a li Hesekê li stûyê HSDê ye û got: "Em di cîbicîkirina erk û berpirsyariya xwe de xemsar bûn, çimkî zanyariyên me yên îstixbaratê hebûn ku niyeta wan a encamdana êrîşê heye, me çend rêkar jî pêk anîn, lê piştre me şikest xwar." Fermandarê HSDê Mezlûm Ebdî destnîşan kiriye: "Beşek berpirsyarî dikeve stûyê civaka navdewletî jî, divê berpirsyariya bi hezaram zindaniyên li girtîgehan û kampên ji aliyê HSDê ve têne birêvebirin, bigrin ser xwe, çimkî hîn jî metirsiyeke mezin a ewlehiyê tên dîtin." Mezlûm Ebdî eşkere kiriye: "Piştî êrîşa ser Girtîgeha Xiwêran, HSD rêkarên bilez ên ewlehiyê ji bo jinavbirina şaneyên razayî yên DAIŞê pêk anîn." Herwiha diyar kiriye: "Di çarçoveya wan rêkarên bilez de, hemû wan girtîgehên ku ewlehiya wan lawaz bûn û pêşbîniya êrîşa weke Girtîgeha Xiwêran dihat kirin, hatin valakirin û zindaniyên wan hatin veguhestin." Ebdî hişyarî da ku tevî kuştina serkirdeyê DAIŞê Ebû Îbrahîm El Haşimî El Qureyşî, DAIŞ hîn jî metirsiyeke mezin e, çimkî çekdarên wê rêxistinê bingeha nenavendî peyrew dikin û li gor rewşa deveran, taktîkên xwe diguherînin. Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragihand, bi sedan endamên DAIŞê ji zindana Hesekê reviyane û hin ji wan gihiştine Tirkiyê. Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan belav kir, di encama êrîşa li ser zindana Sînaa ya Hesekê de, bi sedan endamên DAIŞê ku hin ji wan serkirde ne ji zindanê reviyan e.
Rojnameya Amerîkî "The New York Times" ji ser zarê rayedarekî Amerîkî ragihandibû, "nêzîkî 200 girtiyên DAIŞê ji zîndana Sînaa reviyane."
Diyar kir jî, armanc ji êrîşa li ser zîndana Hesekê ew bû, DAIŞ hin serkirdeyên xwe yên ji asta jor û navîn û hin çekdarên xwedî şarezayên taybet ên wek nîşanvan û şarezayên çêkirina bombeyan, azad bike. Zindana Sînaa ya Hesekê ku nêzîkî 4 hezar endamên DAIŞê tê de bûn, şeva 20ê Çile ji aliyê DAIŞê ve rastî êrîşeke mezin hat û di encamê hejmarek ji girtiyan revaniyan û zîndan ket bin kontrola çekdarên ku di hundir de isyan kiribûn. HSDê roja 26ê vê mehê ragihand, zindana Sinaa bi temamî hat kontrolkirin û piraniya çekdaran xwe radestî hêzên wan kirin. Şêwirmendê Asayîşa Niştimanî ya Iraqê Qasim Arecî ragihand; 20 terorîstên metirsîdar ji Girtîgeha Xiwêran a li Hesekê reviyan û heta niha jî nehatine desteserkirin. Qasim Arecî diyar kir; 20 terorîstên metirsîdar di dema êrîşa ser Girtîgeha Xiwêranê de reviyan û heta niha nehatine desteserkirin û ew ê di pêşerojê de bibin metirsî li ser asayîş û seqamgîriya hemû welatên cîhanê. Arecî eşkere kir; civaka navdewletî mijara çekdarên DAIŞê bi cidî wernegirtiye, ku di pêşerojê de metirsiyeke mezin dê li ser temamê cîhanê dirust bikin.
Welatiyek derbarê vê mijarê de dibêje, me ji roja yekem de got berpirsê yekemê vê êrîşê HSD û PKK ye ji berk u wan dizanîbû dê ev êrîş rû bide û li gor wan, pilana êrîşê li cem wan hebû, lewma divyabû hêzên wan bêhtir amade bana, lê sîxur di nava wan de hebûn û wan rê li ber hatina çekdarên DAIŞê xweş kiriye, mixabin bi sedan ciwanên me bûne qurbaniya şeerekî bê mifa û sûd.
Welatiyek din jî wiha dibêje, serkirdeyên DAIŞê hemû reviyan û gihiştin cihên aram, ev planek bû ku HSD û PKK de têde beşdar bû, û divê baca vê yekî deynin.





# Çarenivîsa xwendina bilind li Kurdistana Sûriyê



Kurdistan-
Salar Xidir

Wezareta Xwendina Bilind ya Sûriyê bi biryarekê xwendin li kolêj û peymangehên Hesekê rawestand. Di daxuyaniyeke fermî de, Wezareta Xwendina Bilind û Lêkolînên Zanistî ya Sûriyê ragihandiye ku xwedinê li kolêj û peymangehên parêzgeha Hesekê yên ser bi Zanîngeha Ferat, radigire. Li gorî ragihandina Wezareta Xwendina Bilind a Sûriyê, sedema wê ragirtinê ew e ku hejmarek ji avahiyên kolêjan li Hesekê rastî têkdan û talankirinê hatine, ew jî piştî rewşa dawî ku bi sedema bûyera Zindana Sînaa ya Hesekê çê bû, bi taybetî Kolêja Endezyariya Çandiniyê. Li gorî zanyariyan, roja 20ê meha derbasbûyî bi sedema şer û pevçûnên ku di navbera hêzên HSDê û çekdarên DAIŞê de li Zindana Sînaa ya li taxa Xiwêran ya Hesekê çê bûn, ziyan gihişte çend avahiyên kolêjên Zanîngeha Feratê li bajarê Hesekê. Di biryara wezareta hikûmeta Sûriyê de nehatiye diyarkirin, kengî careke din ew kolêj û peymangeh dê deriyên xwe li ber xwendekaran vekin.
Bajarê Hesekê, ku navaneda parêzgeha Hesekê ye li Kurdistana Sûriyê û piraniya saziyên rejîmê ligel kolêj û peymangehan di jêr destê rejîma Esed in . Rojnameya Kurdistan derbarê rewşa xwendina bilind li Kurdistana Sûriyê nerînên hin xwendekaran wergirt. Xwendekarê bi navê Elî wiha li ser vê mijarê dibêje"Raste, hin kolêjên zanîngeha Feratê li Hesekê hatine wêrankirin,û heta niha HSD ew radestî rejîma Esed nekirine, lê pirs ji vê yekê mezintir e, PYD û PKK naxwzin xwendina bilind bi zimanê Erebî li Kurdistana Sûriyê bimîne, ji ber ku ew dixwzin edyolojiya xwe bisepîne û wan xwendekaran neçar bike biçin zanîngehên wan, û xwendina wan bixwînin, herwiha rejîma Esed jî vê yekê wekhincet dibîne, û dixwaze zanîngeh girtî bimînin heta ku ji raya giştî re nîşan bide ku PYD nahêle xelk bixwînin, û bi rastî jî ev partî vê hincetê dixe destê rejîmê de, niha xwendekardi nava du agiran de mane, û nizanin dê çarenivêsa wan çi be, lewma divê çareseriyek ji wan re were dîtin".
Xwendekar Sîpan jî wiha dibêje"Xwendekar bê xwendin mane,bi taybet Kurd, niha hejmara Kurdan li zanîngehên Sûriyê gelekî kêm bûne, ez dikarim bibêjim li ser destan têne hejmartin û bi taybet ewên ku pizîşkiyê dixwînin, hemareke kolêj li Hesekê mane ku ser bi zanîngeha Feratê ya Dêrazorê ne, û ji ber rewşa ewlekariyê xwendekar nikarin biçin Dêrazorê heta ku xwendina xwe berdewam bikin, tê gotin ku hin hewl hene ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê"
Ehmed jî ku xwendekar e û xelkê Dêrikê ye wiha dibêje" em rêyeke dirêj digrin heta ku bighên Hesekê ji bo ku xwendina xwe temam bikin, tevî ku çend caran astengî ji me re derketin, û rê li basên me ji aliyê grûpên ser bi PYD ve dihate girtin, em nikarin biçin Heleb û Şamê û Laziqiyê, lewma ya herî nêzîk kolêjên li Hesekê bûn, lê niha heger bi vî awayî berdewam bike ew ji xwendinê bêpar dimînin, û neçar dibinin xwendina PKK bixwînin û ev yek jî zehmet e ji ber ku xwendina wan li gor edyolojiya wan e, dûrî pransîpên sereke yên xwendinê ye, çarenivîsa xwendinê li Kurdistana Sûriyê berev cihekî tarî ve diçe, çi li ser asta xwendina seretayî yan xwendina bilind be, lê ji ber vê yekê divê sînorek ji van kiryaran re were danîn, û civaka navdewletî bi taybet rêxistinên Neteweyên Yekgirtî destêwerdanê bikin û bihêlin ku xwendin berdewam bike û nekeve çarçoveyeke siyasî û her aliyek ji berjewendiya xwe ya taybet re bikar bîne wek ku niha em vê yekê dibînin."

## Mirovê winda



Diya Şiyar

Gereke her mirovek ji xwe bipirse çi ji vê jiyanê dixwaze û mafê xwe nasbike û li peyî doza xwebe li nav gendeliyê vê civaka xerab û tev qirêj windanebe bi hezara mirov tên vê jiyanê û dirin mafê wan li ber çavê wan dire û bê deng dimînin nikarin bixwazin dibin zilm û zorê de dijîn û ji destê wan kesê mejîyê hov wan tine dikin ew kesê hejar û perîşan mafê wan li nav nigan dire û ber avêtî dibe û cîlek dispere cîlekî
Ez ban dikim hemî mirova li mafê xwe xwedî derkevin bese bê dengî em tev mêvanin li vê jiyanê mirov rojekê çê bûye û wê rojekê jî barke serê xwe ji kesî re neçimîne roja tu ji dayik bûye tu azade û bera tu bi azadî jî here gore li mafê xwe û zarokê xwe û bav û kalê xwe xwedî derkevin cî û warê teye xaka teye kultûra teye zimanê teye ji mafê teye tu dengê xwe bilind bike û bêje dunyayê tevî ez mafê xwe dixwazim gelê mino ku tu doza mafê xwe neke kes nade te û te li ber çavê xwe nabîne bê denge nebe mafê te hebûna teye zimanê te nasnama teye azadiya milet û serxwebûna kurdistanê ji mafê teye ne mineteke ji bo te pêşe roja zarokê xwe biparêze gelê mino

